

Dibistan ji bo zaroka te ye

Biroşûreke li ser wan pîlanênperwerdeyên nû û qanûna nû ya dibistanê ku berê xwe dide te yê ku zarokên wî li dibistanabingehîn, dibistanabingehîn ya perwerdeya taybetî, dibistanataybetî yan jî dibistana laponî hene



Skolverket

Tu giringî

Tu yî yê herî nêzîkî zaroka xwe. Ji bo wê jî giringe ku tu û dibistana zaroka te têkili û hevkarîyên we yên baş hebin ji bo pêşketina zaroka te. Bi hevkarîyê imkanên zaroka te bilind dibin ji bo di zanyarî û pêşketina civakî de bighîje dereceya herî bilind.

Bi zanîna li ser wezîfeya dibistanê imkanên te zêdetir dibin ji bo tu bikaribe hevkarîyê bi dibistana zaroka xwe re. Di vê biroşûrê de tê agahdar bibe li ser hinek gorînên ku niha li dibistanê tên pêkanîn û tesîrê li çûyîna zaroka te li dibistanê dike.

MEFHÛMÊN DÊÛBAV Û WELÎ

Ya normal ew e ku dê/bav yan jî dêûbav her du welî ne ji bo zarokê Welî berbirsiyare ji bo zarokê û divê bi erkê lênêrînê, ewleyî û perwerdeyek baş rabe. Welîyê zarokê bi awayekî mezin û her tim heqbideste ku hemî agahiyên li ser zarokê yan jî şagirt li dibistanê bidestxe, heta bi wanên bi nehênî parastî jî. Dêûbavê ku ne welî be, ne heqbideste ku agahiyên bi nehênî-parastî li ser zarokê bidestxe.

Berbi armancek wekhev

Qanûnadibistanê û pîlanaperwerdeyê divê çûna dibistaneke wekhev û bi qalîteyek baş ji bo hemî şagirtan, bêyî li ku bîjîn yan jî herin çî formê dibistanê yan jî kîjan dibistan be jî garantî bike. Ew ji bo xebatê rêbazek wekhev dide hemî dibistanan. Parlemantoyê biryar li ser qanûnek nu ya dibistanê girtiye ku ji bo hemî awayê perwerdeyên ji bo zarok û ciwana ye li Swêdê.

Di qanûnadibistanê de nivîsîye wek hinek tiştên din jî ku hemî şagirt divê têkildar bin di perwerdeyê de heger tu sedemên wan yên maqûl ji bo nehatinê nebin. Tu wek dêûbav yê/ya berpirsiyarî ji bo zaroka te here dibistanê. Heger te neçûna zaroka xwe ji dibistanê re negotibe û dîse jî zarok bê sedem ne çûbe hingî li gor qanûnadibistanê divê tu di wê rojê de bê agahdarkirin. Heger tu ji bo zaroka xwe iznê bixwaze tê hingî serî li midîrê dibistanê bide.



Biryara iznê midîr dide. Heger tu daxwaza azadbûna ji derseke xwendinê ya mecbûrî ji bo zaroka xwe bike hingî jî divê tu serî li midîr bide. Imkanên azadbûnê ji babetekî wilo ligor qanûnadibistane ya niha kêmtir buye. Midîr di kare bi pejirêne bi tenê dema sedemên taybet hebin, û divê ji bo çend caran be di nava salake xwendinê de û nabe ku rê liber imkanên şagirt yê taybetî ji bo tekûzkirina zanyariyê bigre. Ji mafê te ye ku tu biryareke wilo îfraz bike li cem dadgehaîdarî.

Meqamêsereke (beledî yan jî heyeta dibistanaserbixwe) berpirsê dibistanê yê serreke ye li herêmê. Heger nakokiyek peyde bibe ku tu û personal û idara dibistanê bixwe nikaribin hel bikin tu dikare serî li meqamêsereke bide. Hemî meqamêsereke divê xwediyê rêbazê nivîskî bin ji bo gilî li hemberî perwerdeyê were qebûl kirin û lêkolîn li ser werekirin. Tu dikare li dibistana zaroka xwe li wan bi pirsê.

Di qanûnadibistanê ya nu de beşek qaîdeyên nu li ser ka dibistan dikare çi bike dema şagirtek nîzamê aciz bike, bê mesuliyet hereket bike yan jî xwe tawanbar bike ji bo hinek tiştên ciddî. Ji bili ku şagirt ji dersxanê were avêtin heta dawiya dersê û di dersxanê de cezayê rûnşitînê bigre, mîdîr jî dikare hişyariyê bi nivîskî bide wî. Divê hişyariyê de wê agahdariya li ser heger şagirt xwe rast neke wê çi bibe bê nivîsîn. Wek nimûne şagirt dikare were guhastinê dibistaneke din ji bo demeke nedomdar.

Qanûnadibistanê imkanê dide midîr ku şagirtekî ji dibîstanabingehîn, dibîstanataybetî û dibîstana laponî qut bike, heger pêwîstî ji bo emniyeta şagirtên din û aramiya xwendina wan hebe û heger tedbîrên din ti alîkarî nekiribe. Qutkirin divê yekcarê ji hefteyekê ne bêhtir be û di nîvsalakê de jî ji du hefteya ne bêtirbe. Ji heqê şagirtê ku tazmînat bigre ji bo wê perwerdeya ku ew jê mayî û tu jî weku welî xwedî mafê îtirazê yî ji bo biryara midîr li cem dadgehaîdarî.

Pîlanaperwerdeyên nu

Ligor qanûnadibistanê pîlanên dibîstana bingehîn, dibîstanabingehîn ya perwerdeya taybetî, dibîstanataybetî yan jî dibîstanalaponî ji nuve hatiye dirûstkirin ji bo hemî formên dibîstanan bibin xwediyê pîlana xwe. Hemî dibîstan, yên belediyan, yên serbixwe û yên dewletê wê ligor pîlanaperwerdeya ku wê ji bo forma wê dibîstanê ye bê meşandîn. Bi xwendina pîlanaperwerdeyê tê zanibe dibîstan li ser kîjan bingehêngirîng hatiye danin û wezîfe û armancên wê çine. Pîlanênkursan û daxwazên zanyariyê jî bi pîlanaperwerdeyê ve girêdayî ne.

Bê dibîstan wê çawa karê xwe hilbijêre wek hev nîne, ew îdareya dibîstanataybet û personalên xwe bi hev re digihin wê yekê. Divê mecala têkildariyê di wê xebatê de bidin şagirtan jî. Tu wek dêûbav dikare têkildar be di wan civîn û guftugoyên pêşketinê de dema tu tê wexwendin ji bo civînê û tu dikare têkilî bi dibîstana zarokên xwe re deynê ji bo hevkarîyê bi awayên din.

PÎLANAPERWERDEYÊ

Beşê yekê yê pîlanaperwerdeyê qala bingehêngirîng yên dibîstanê û wezîfeyên wê dike. Li vir tê misogerkirin ku çalakiyên dibîstanê divê ligor nirxandinên civakê yên demokratîk werin kirin û hemî kesên ku li dibîstanê di xebitin divê rêzê li giringiya her merivî û derdorê bigrin.

Beşê duyem yê pîlanaperwerdeyê bi berfirehî li ser armanc û riyên ji bo perwerdeyê ye. Li vir qala pîvanên, nirxên û zanyariyên ku divê hemî şagirt bighinê di dema dawîanîna dibîstanê de dike û bi pêşxisti be. Divê ev armancên hanê ji aliyê perwerdeya hemî babetên dibîstanê ve bibin alîkarê pêşketinê. Her du beşên pêşî



yên pîlanaperwerdeyê bi hindikayî û bi hinek istisna xebata sinifê pêşdibistanê û ya mala demavala jî dide berxwe.

Di beşê sêyem de jî bahsa pîlanênkursan û pêre jî daxwazênzanyariyê di hemî babetan de têkirin.

AN Û DAXWAZÊNZANYARIYÊ

Pîlanakursê di hemî babetan de dibêje çima babet li dibistanê heye, armanc ji perwerdeyê çiyê û kîjan zanyarîne yên ku zaroka te imkana pêşdexistinê divê bidest bixê. Pîlanakursê naverokê merkezî jî nîşan dîke. Ew naveroka mecbûrî ye ya ku perwerdeyî wê liser bi xebite, lê imkanên wê dibistanê hene ku hinek naverokên din jî lê zêde bike.

Daxwazênzanyariyê di babet de pîlanakursê temam dîke û tê bikaranîn ji bo pêşketinazanyariya zaroka te bi nirxîne. Ew hizir dikin bê şagirt di hinek demên diyarkirî de divê çî fêr bibin û ev yeka ha çawa tê ifade kirin. Di dibistanabingehîn de daxwazênzanyariyê ji bo zanebûneke ku bê qebûlkirin heye, di dawiya

sinifa sêyem de ji bo dersên swêdî, swêdiya wek zimanê duyem, matematik, babetên zanyariyêncivakê û babetên xwezazanistiyê hene. Di sinifê şeş de daxwazênzanyariyê ji bo hemî dersan heye ji bilî zimanên modern û di sinifê neh de jî ji bo hemî babetan heye.

Di sinifa sê de pîvanên daxwazênzanyariyê tîen bi karanîn ji bo bi nirxînî ka zaroka te gihaye wan zanyariyên ku divê werin qebulkirin. Di sinifa şeş de (ji salxwendinê ya 2012) û di sinifa neh de pîvana daxwazênzanyariyê tîen bi karanîn ji bo bi nirxînî ka kîjan pêpelûka derecê ligor zanyariya zaroka te ye di wê babetê de. Daxwazênzanyariyê ligor pîvaneke nuh hatiye dirustkirin û bi rêkûpêk hatiye nivîsîn û di sinifa şeş û ya neh de pêpelûkên derecê E, C û A ye. Gotina qebulkirina zanyariyê ew e ku pêpelûka herî nizim ya qebulkirin zanyariyê ye, ew jî di pîvanê de E ye.

Di dibistana perwerdeya taybetî de pîvana daxwazazanyariyê di dawiya sinifa şeş û di dawiya sinifa neh de ji bo hemî babetan heye. Di dibistanaantremanê de pîvana daxwazazanyariyê ji bo zanyariyên bingehîn û zanyariyên lêhurbûnê di dawiya sinifê neh de heye.

Di dibistanataybetî de, ya ku deh salin, pîvanên daxwazênzanyariyê ji bo yê tîen qebulkirin di dawiya sinifê çar de ji bo swêdî, swêdiya zimanê duyem, matematik, zimanê îşaretan ji bo kerrûlalan, babeta zanyariyacivakê, babeta zanyariyaxwezayî heye. Di sinifa heft de pîvana daxwazazanyariyê ji bo hemî babetan ji bilî zimanên modern û di sinifa deh de pîvana daxwazazanyariyê ji bo hemî babetan heye.

Dibistanalaponî ligor pîvanên daxwazênzanyariyê yê dibistanabingehîn dimeşin û ji bo sinifa sê û şeş e.

Li pêş di nivîsê de, dema qala pîvanên daxwazênzanyariyê tîen kirin agahdarî îşaret bi dibistanabingehîn dike. Ji bo te yê ku zaroka wî li dibistana perwerdeya taybetî, dibistanataybetî yan jî dibistanalaponî heye hingî agahdariyên di çerçûfê de dimeşin.

Tu di xwaze bêtir li ser qanûna dibistanê bi xwêne yan jî pîlanaperwerdeyê tu dikare di malpera Idareyadibistanê:

www.skolverket.se/skollagen2011 (qanûnadibistanê)

www.skolverket.se/nyalaroplaner (pîlanaperwerdeyê) de bibîne


PÎVANÊN NU JI BO QERNÊ

Pîvanek nu ji bo qernê bi gelek pêpelûka destpêkiriye. Pîvanên qernê yên nu şeş gavin: A, B, C, D, E û F. Pêpelûka A ya herî bilinde lê E ya herî nizm tê qebûlkirin. Pêpelûka F ya ku ne qebule. Heger şagirt bê sedem gelekî ji dibistanê mabe qerne bi xetekê tê nîşan kirin.

Ji bo dibistanabingehin ya perwerdeya taybetî qerne ji pênc pêpelûkan pêk tê: A, B, C, D û E. Qerneya F yan xet di pîvanê de tunin. Heger şagirt li dibistanbingehin ya perwerdeya taybetî ne gihîştibe heqkirina qerneya E, yan jî bê sedem ji dibistanê mabe, hingî qerneya wê babetê nayê danîn.

Ji bo qerneya A, C yan E bê wergirtin divê daxwazazanyariyê bi temamî were pêkanîn. Ji bo qerneya B bê wergirtin divê daxwazazanyariyê ya ji bo C û piraniya daxwazazanyariyê ya qerneya A were pêkanîn. Bi eynî awayî ji bo qerneya D bê wergirtin divê daxwazazanyariyê ya qerneya E bi temamî û piraniya daxwazazanyariyê ya qerneya C bê wergirtin.

Heger tu yan jî zaroka te li ser sedemên hinek qerneyan meraqa tiştê bikin hingî ligor qanûna nu ya dibistanê ji heqê we ye agahdariyê bi destbixin.



QERNE JI SINIFÊ ŞEŞ PÊDE

Ji payiza 2012 pêde wê qerne were danîn ji sinîfê şeş û ji wir û pêde jî ji bo her nîvsalaxwendinê heta qerneyadawî ya sinîfê neh. Qerneya nîvsalaxwendinê wê were danîn ligor zanyariyên ku şagirt pêşxistiye ji bo wê termînê. Nirxandina ji bo sinîfa şeş wê were danîn ligor daxwazazanyariyê di salaxwendinê ya şeş de bi destxistî. Ji salaxwendinê ya heft û pêde nirxandin tê danîn ligor daxwazazanyariyê ya salaxwendinê ya sinîfê neh.



Nirxandin û peyivîn li ser pêşveçûnê

Ji bo mirov misogerbe ka pêşveçûna zaroka te ligor armancên rêbaza pîlanaperwerdeyê bi berfirehî û ligor armancên demdirêj ji bo her babetekî bimeşe, hingî pêwîste ku xebata dibistanê bi hevkarîya malbatê re bê kirin. Di nava salaxwendinê de mamoste berde wame liser nirxandina fêrbûna zaroka te û pêşketina wî/wê. Tê agahdarbibe li ser vê yekê bi kêmayî carekê di nivsalêde dema tu û zaroka te bi diyarî mamoste yan mamostê sinîfê dikevin di xebardana li ser pêşveçûnê de.

Di dema hevdîtina xebardana li ser pêşveçûnê wê pîlanapêşveçûnê ya ferdî jî were amadekirin. Naveroka pîlanapêşveçûnê ya ferdî ji nirxandinên li ser pêşveçûna zanyariya zaroka te ji wan babetên ku zaroka te lê perwerde buye pêktê. Naveroka wê dise wê bi xulaseya wan tedbîrên ku pêwistin were dagirtin ji bo ku zaroka te bighe armancên xwe û di pêşveçûna xwe de heta karibe here.

Tu divê bêtir li ser xebardana li ser pêşveçûnê , pîlanên pêşveçûnê yê ferdî bi nirxandinên nivîskî (IUP) û programatedbîran bixwêne, agahdarî di malpera Skolverket:

www.skolverket.se/iup

Mafê xwe pêşxistinê heta karibe here

Hemî şagirt divê têra xwe bêne teşwîq kirin di fêrbûna xwe û di pêşveçûna xwe ya ferdî de ji bo di pêşveçûna xwe de heta dawî karibin herin. Heta ji bo şagirtên ku ji wan re hêsana jî ku bighine daxwazên zanariyê. Ew şagirtên ku tirs heye neghine daxwazên zanariyê yê herî nizm ku divê bighinê jî, heqê wan heye alîkariya taybetî bistînin. Ew di berpirsiyariya midîr de ye ku lêbikole pêwîstiya şagirt ya alîkarî çiyê û heger bê xuyakirin ku alîkariya taybetî ji şagirt re pêwîste hingî divê programatedbîran were amade kirin.

Heqê te û zaroka te heye amadebin dema programatedbîran were amade kirin. Niha Ligor qanunadibistanê ji heqê te ye yek gilî li biryara midîr ya li ser programatedbîran bike li cem komîteya gilî ya idareyadibistanan. Li ser biryareke ku programeketedbîran wê neyê amade kirin yan jî bişikil kirina wê û naveroka yek programatedbîran e. Imkana te heye ku tu gilî li biryara midîr dayî ji bo alîkariyê taybetî ku ji komeke perwerdeya taybetî re here yan jî ferdî be, yan jî heger midîr biryar dabe ku wê li çûna xwendinê were banîn.





Ma tu divê hemî pîlanaxwendinê bixwene?

Tu dikare bixwaze yan jî derxîne ji malpera skolverket www.skolverket.se

ISBN 978-91-87115-00-4
Grafisk form: AB Typoform
Omslagsfoto: Michael McLain
Foto inlaga: Michael McLain
Skolverket 2011

Skolverket